



Research Article

International Journal of Kurdish Studies

11 (1), pp. 399-422

<http://www.ijoks.com>

Destanên Kurdî Ji Alîyê Tema û Mijarên Xwe ve

Hikmettin ATLI¹ 

Received: Dec 3, 2024

Accepted: Mar 15, 2025

Kurte

Di nava berhemên wêjeya gelêrî de herî zêde cureya destanê bi temsîla nasnameya civakî û çandî derketiye meydana. Lewra ku destan di asteke bilind de bi dîrok û serhatîyên giring yê civakê re girêdayî ne û di nava demê de wekî temsîla hîs û hestên hevpar yê civakê derketine pêş. Li kêleka taybetmendîyên dirûvî, di destanan de tiştên ku herî zêde balê dikêşe tema û mijarên wan in. Ev tema û mijar, fikriyata giştî ya civakê, xwendina civakê ya di heqê qewimînên berê de û di heman demê de hêvî û xeyalên wê yê di heqê pêşerojê de di hundirê xwe de dihevin. Di nava civaka kurd de jî vî cureyê giring bi kevneşopîya dengbêjîyê ve girêdayî ji berê ve bi rengekî gelekî dewlemend heye û hê jî berdewam e. Di vê vekolînê de em hin destanên sereke yê civaka kurd wekî Memê Alan, Siyabend û Xecê, Kela Dimdim, Kerr û Kulik, Zembîlîroş, Derwêşê Evdî û Edûlê û Cembelî û Binevş di çarçoveya tema û mijarên wan de vedikolin. Bi cureyê destanê re têkildar bi taybetî jî ji alîyê pênaseyî ve gelekî nîqaş hene û li gorî mecra ya van nîqaşan hin ji van vegotinan dikarin ji navê bîne derxistin û hinên di jî lê bîne zêdekirin. Ji ber ku di pênaseya destanê de hem aliyên dirûvî û hem jî aliyên tema û mijarî hatine îşaretkirin, ev yek di pênaseya cureyî de tevliheviyekê çê kiriye. Hin vegêran bi tenê li gorî krîterên dirûvî û hin jî li gorî krîterên tema û mijarî hatine pênasekirin. Di vê vekolînê de em hewil didin ku ji alîyê tema û mijaran ve bersivê bidin vê problemê û hin vegêranên ku ji alîyê dirûvî ve li ser destanbûna wan tu şik tune, ji alîyê tema û mijarên wan ve jî binirxînin û tevkarîyekê li qadê bikin.

Bêjeyên Sereke: Destan, tema, mijar, wêjeya gelêrî, kurd

Recommended citation:

Atlı, H. (2025). Destanên Kurdî Ji Alîyê Tema û Mijarên Xwe ve. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (1), 399-422, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1595895>

¹Corresponding Author, Ph.D., Lecturer, Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages, Türkiye. E-mail: bedranh@gmail.com ORCID: <https://orcid.org/0000-0002-0868-3294>

Kurdish Epics In Terms of Topical and Thematic Features**Abstract**

Among the folk literature products, the epic genre stands out the most as the representation of social and cultural identity. Because the epic is very related to the history of the society and the important events they experienced and it represents the common feelings and emotions of the society from which it emerged towards these history and events. The most striking aspects of epics, in addition to their formal features, are their themes and topics. These themes and topics include the society's general ideas, their readings of past events, as well as their hopes and dreams for the future. In connection with the Dengbêj tradition, this genre has continued to exist in a very rich form within the Kurdish society and still continues. In this review, we will examine the main epics of the Kurdish society, such as Memê Alan, Siyabend û Xecê, Kela Dimdim, Kerr û Kulik, Zembilfiroş, Derwêşê Evdî û Edûlê and Cembeli û Binevş, in the context of their themes and topics. There is a lot of debate regarding the genre of epic, especially from the definitional point of view, and depending on the context of these debates, some of these narratives can be removed and others can be added. Since both the formal aspects and thematic and subject aspects have been indicated in the definition of epic, this has created confusion in the definition of the genre. Some narratives have been defined only according to formal criteria and some according to thematic and subject criteria. In this study, we try to answer this question in terms of themes and subjects and to contribute to the field by evaluating some narratives, whose formal epicness is beyond doubt, in terms of their themes and subjects.

Keywords: Epic, theme, subject, folk literature, kurd

Konu ve Tematik Özellikleri Bakımından Kürt Destanları**Öz**

Halk edebiyatı ürünleri arasında en çok destan türü sosyal ve kültürel kimliğin temsili olarak öne çıkmıştır. Çünkü destan, toplumun tarihi ve yaşadıkları önemli olaylarla oldukça ilgili olup, içinden çıktığı toplumun bu tarih ve olaylar karşısından ortak his ve duygularını temsil eder. Destanların, şekilsel özelliklerinin yanı sıra en dikkat çekici yanları tema ve konularıdır. Bu tema ve konular toplumun genel fikir dünyasını, geçmiş olaylara ilişkin okumalarını ve aynı zamanda geleceğe dair umut ve hayallerini içermektedir. Dengbêj geleneği ile bağlantılı olarak bu tür, Kürt

toplumunun içinde de oldukça zengin bir biçimde varlığını sürdürmüş ve halen de devam etmektedir. Bu incelememizde Memê Alan, Siyabend û Xecê, Kela Dimdim, Kerr û Kulik, Zambîlîfiroş, Derwêşê Evdî û Edûlê ile Cembeli û Binevş gibi Kürt toplumunun belli başlı destanlarını tema ve konuları bağlamında inceleyeceğiz. Destanın türüyle ilgili özellikle tanımsal açıdan pek çok tartışma mevcut olup, bu tartışmaların bağlamına göre bu anlatıların bir kısmı çıkarılabilir, bir kısmı da eklenebilir. Destan tanımı yapılırken hem şekilsel yönüne hem de tematik ve konu ile ilgili yönler vurgu yapılması, bu türün tanımında bir kafa karışıklığı yaratmıştır. Bazı anlatılar sadece şekilsel kriterlere göre, bazıları ise tema ve konu kriterlerine göre tanımlanmıştır. Bu incelememizde temalar ve konular açısından bu soruna cevap vermeye ve şekilsel bakımdan destan olmaları ile ilgili hiçbir şüphe bulunmayan bazı anlatıları, temaları ve konuları açısından değerlendirip alana katkı sağlamaya çalışıyoruz.

Anahtar Kelimeler: Destan, tema, konu, halk edebiyatı, kürt

Destpêk

Digel ku bi cureyê destanê ve girêdayî di nava civaka kurd de gelekî berhemên gelêrî hene jî di vê xebatê de em ê vekolîna xwe bi heft destanên kurdî bi sînora bikin. Ev destan bi vî rengî ne: *Memê Alan, Siyabend û Xecê, Xanê Lepzêrîn, Zembîlîfiroş, Cembelî û Binevşê Narîn, Derwêşê Evdî û Edûlê, Kerr û Kulik*. Wekî ku ji nîqaşên li ser pênasêya destanê jî diyar e, yek dikare di heqê navê termînolojîk yê van vegêranan de nîqaşekî zanistî bike. Herwiha hin kes dikarin îtraz li vê lîsteyê bikin û hemî vegêranên lehengî û evînî ku ji alîyê dengbêjan ve têne gotin bixin nav vê kategoriyê û herwiha vegêranên ji zaravayên dî jî dibe ku lê bêne zêdekirin ku hingê dê ev lîste gelekî dirêj bibe. Hin ji vanan jî alîyê xwe yê dirûvî ve dişibin destanan hin jê jî ji alîyê temayên xwe ve dişibin destanan. Ya rast di dîroka mîletan de bi hejmarek wiha zêde destan nayêne dîtin. Lê dîsa jî ev mijara nîqaşê ye ku çarçoveya vê nivîsê dibuhure (Atlı, 2024: 70). Me çarçoveya vê vekolînê bi van heft vegêranan bi sînora kiriye û bi rêya analîza li ser wan em dixwazin di heqê tema û mijarên destanan de bigihîjin qenaetekê.

Ji bo berhemên folklorî û bi taybetî jî wêjeya gelêrî meseleya cure û tesnîfê meseleyeke giring e. Lewra ku pênasê girêdayî tesbîtkirina cureyî ye û eger berhemeke folklorî nehatibe pênasêkirin hingê cureyê wê jî nehatiye tesbîtkirin. Ev yek jî bi xwe re kaosekê tîne ku ne pêkan e li wê derê vekolîneke zanistî bê kirin. Richard Bauman jî bo cureyê dibêje; cure ji rengê îcraya ku bûye

tradîsyon re tê gotin (Bauman, 2006: 109). Li gorî vê tesbîtê yek dikare îdîa bike ku cure li gorî taybetmendiyên şeklî yên berhemekê diyar dibe. Bêguman taybetmendiyên dirûvî îşaret bi alîyekî giring yê berhemê dikin lê bi ya me ji bo tesbîtîkirina cureyê bi tenê têr nakin. Herwiha tema û mijarên berhemên folklorî jî li ser cureyê xwedî bandoreke giring in. Lewre dibe ku ji alîyê dirûvî ve zêmarek (bnr. Keskin, 2009:157-161), fablek (bnr. Çaçan, 2010: 101-104) û destanek (bnr. Cindî: 2016: 67-85) di heman formê de bin an jî forma wan nêzî hev be lê dema ku em wan dixwînin an jî guhdar dikin, ji ber bandora tema û mijarên di wir de, em dikarin cureyê wan ji hev cuda bikin û ji yekê re zêmar, ji yekê re fabl û ji yekê re jî destan bibêjin. Herwiha rewşeke berevajî vê jî dikare bê îdîakirin wekî ku di çîrokên *Mîrze Miheme* (bnr. Öner, 2016: 13-25) û *Destana Siyabend û Xecê* de (bnr. Celîl, 2013: 104-134) derdikeve pêş me. Ev her du vegêran ji alîyê tema û mijarên xwe ve gelekî nêzî hev in lê ji alîyê şeklî ve ji hev cuda dibin. Lewre ku ji yekê re çîrok û ji ya dî re destan tê gotin. Hingê em bi kurtî dikarin bibêjin ku taybetiyên dirûvî û tematik bi hev re û heta fraksiyonên dî yên ku perçeyên îcrayê ne (guhdar, vebêj û mekan) hemî bi hev re bandorê li ser cureyê dikin.

Digel ku Keskin jî di tesbîtîkirina cureyê de giringiyeke zêde daye temayê (Keskin, 2019: 178-179), bisînorkirina wî ya temayê ya bi ser lehengîyê ve ji bo pênaseya destanê valahîyeke berbiçav dihêle. Nêrîneke nêzî ya Keskin di nêrîna Kaplan de jî derdikeve pêş me. Ew jî destanan ji alîyê temayê ve bi temaya lehengîyê ve girê dide û wiha dibêje: “Bi giştî ji pênaseyên destanê tête têgehîştin ku divê destan hêmanên wekî qehremanî, lehengî, kes û rûdanên derasayî, hesta netewî, dînî an eşîrî di nava xwe de vehewîne.” (Kaplan, 2022: 273-292). Her çendî ku herdu lêkolîneran jî di tesbîtîkirina cureyê de giringî bi tema û mijarê dabe jî bisînorkirina wan ya mijar û temayan bi taybetî jî lidervehiştina temaya evînê, rê digire ku pênaseyeke berfireh ji bo cureyê destanê derkeve meydana. Subaşı, destanê wekî têgiheke sîwan qebûl dike û di binê vê têgihê de li gorî tema û mijarên wan îşaret bi gelekî binbeşan dike. Li gorî Subaşı heft kategorîyên binbeş yên destanan ev in: Destanên lehengîya mitolojîk, destanên evînî yên mitolojîk, destanên lehengîya mêjûyî, destanên dînî (beyt/qewl), destanên li ser afat û karesatan, destanên evînî yên mêjûyî, vegêranên strankî yên li ser şair û dengbêjan (Subaşı, 2024: 6-7). Herçendî ku karîgeriya vê senifandinê hebe jî Subaşı zêde ketiye nava hûrgiliyan û xwestiye li gorî her temayê binbeş an bincureyekî tesbît bike. Bêguman hejmara temayan gelekî zêde ne û nabe ku her tema beramberî bincureyekî be. Kardaş, destanan bi piranî bi bûyerên rastîn û dîrokî ve girê dide û li gorî wî di destanan de herî zêde temayên lehengîyê hene (Kardaş, 2013:185). Her çendî ku destanên bi vî

rengî hene jî di destanan de ya herî giring ne ew e ku ew bûyerên rastîn in an na. Ya giring ew e ku yê ku neqil dike (dengbêj) û yên ku guhdar dikin ji rastiya wan bawer in. Lê dibe ku di eslê xwe de ne rast bin jî. Felix J. Oinas kategorîyên destanan wekî şamanîstîk, lehengî, romantîk û dîrokî tesbît dike ku em dikarin van wekî temayên sereke yên destanan qebûl bikin (Oinas, 2015: 234-244). Oinas, kategoriya şamanîstîk bi sêhr û derasayîyan ve girê dide ku ev yek di çanda rojhilatî de teqabûlê hin kiryarên derasa yên şexsiyetên dînî/terîqî dike. Herwiha Oinas qeyd dike ku di kategoriya romantîk de temaya lehengîyê tune ye û bi temamî bi serborîyên evînî ve girêdayî ye. (Oinas, 2015: 236-237).

Li vê derê divê em destnîşan bikin ku di destanan de ev tema ne şert e ku bi tena serê xwe hebin. Dibe ku di di heman vegêranê de çend tema bi hev re derkevin pêş me. Wekî dînî-lehengî, lehengî-dîrokî, lehengî-evînî, dînî-evînî û hwd. Mînakên destanên bi vî rengî hem di çanda cîhanê de hem jî di çanda kurdî de de hene.

Linda Degh, li ser zehmetîyên pênasêya cureyê destanê, balê dikêşe ser herêmîbûna vê cureyê û qeyd dike ku cureyên mîna çîrokan li gorî destanê bêtir gerdûnî ne. (Degh, 2006: 147-148). Li gorî Degh, di destanan de refleksên herêmî û konjektorî bêtir derdikevin pêş me lewre di pênasêya destanê de jî dibe ku li gorî herêman cîyawazî çê bibin. Herçendî ku Degh jî ji vê nuqteî nezerê balê dikêşe ser bingeheên “neteweyî” yên destanê, bi ya me nîrxandineke di çarçoveya hizra netewetîyê de nêrîneke anakronîk e û me ber bi têgihîştineke tam ya vî cureyî ve nabe. Bêguman nasnameya etnîk nasnameyeke dîrokî ye û di destanan de îşaretên vê yekê hene. Lê etnîsîte û netew du prosesên cuda ne û nabe ku nasnameya etnîk wekî nasnameya neteweyî bê dîtîn. Oinas di çarçoveya vê nîqaşê de balê dikêşe ser mînakên Rûsyaya Sovyet û qeyd dike ku li Sovyetê ev nêrîn yanê girêdayîna bingeheên destanê bi nasnameya neteweyî ve, wekî polîtîkayeke dewletê hatiye organîzekirin da ku têkilîya destanê ya bi zumreya arîstokrasîyê re bê redkirin (Oinas, 2015: 235-236). Ya rast ev karakterên ku di van vegêranan de derdikevin pêş me wekî prens, prenses, mîr, mîrza bi temamî aydê dewra arîstokrasîyê ne û herwiha vîzyona ku di van vegêranan de derdikeve pêş me bingeha xwe ji hêmanên jîyana feodal û eşîrî digire. Her wekî ku Boratav jî neqil dike: Mirov dikare bibêje ku destan cureyekî edebî yê zumreya arîstokrasîyê ye. Muherîrê destanê jî girêdayî vê nîzama civakî ye (Boratav, 1988: 57-70).

Bêguman ji roja îroyîn em binêrin em nikarin tesbît bikin ku destanên pêşîn di kîjan şertan de derketin û di kîjan formê de derketin. Çawa ku di hemî cureyên dî yên xwezayî, mirovî û civakî de derdikeve pêş me tu hêmana mirovî, civakî û xwezayî bi tevahî ne aydê demekê an jî

serdemekê ne. Ew di nava prosesê tekamulê de derbas dibin û digihîjin roja îroyîn. Li gorî karaktera ruhê her serdemê hin tiştan hildigirin ser xwe û hinan davêjin. Ji bo cureyê destanê jî ev yek bi heman rengî ye. Ew parçeyê vegêrana arkaîk an jî mîtîk/şamanîstîk bûn û dûre di serdema navîn/feodal de gihîştin forma xwe ya bêqisûr. Metnên destanî ku îro li pêş me ne bi piranî şopên dewra arîstokrasiyê di xwe de dihevin û tema û mijarên wan jî di çarçoveya ruhê vê serdemê de ne. Lehengên wan bi piranî kesên ne ji rêzê ne û xwedî taybetîyên derasayî ne. Temayên wan vegêranan; lehengî, evînî û carinan jî exlaqî ne. Her çendî ku mijarên dîrokî û dînî jî di destanan de derdikevin pêş me, di wan de jî bi piranî tema yan lehengî/hamasî yan jî evîn e. Ew girêdayî kevneşopê dengbêjî/ozanîyê pêş dikevin lewre bi piranî ji alîyê dirûvî ve helbestî an jî helbestî-pexşanî ne. Eger ew bi tevahî vegeriyabin forma pexşankî û vegêrê wan êdî ne dengbêj lê çîrokbêj bin, herwiha refleksa civakê ya li hember wan jî guherîbe hingê em dikarin bibêjin ku li wê derê nasnameya cureyî jî êdî guherîye.

1. Destanên Kurdî

Di nav civaka kurd de kevneşopê destanî bi awayekî xurt bi çanda dengbêjîyê ve girêdayî ye. Çanda denbêjîyê jî bi nîzama civaka feodal ve girêdayî ye. Yanê di berdewamîya berhemê folklorî de, di parastin û pêşxistina cureyî de tenê hebûna hikayetê têr nake. Divê ew hikayet ji alîyê hin kesên profesyonel ve bê gotin û di heman demê de eger meclîs be, eger dîwan be yan jî binê konekê be divê civateke guhdar jî hebe. Yanê vebêj, hikayet û koma guhdar bi hev re di berdewamîya wî cureyî de xwedî rol in. Dundes di gotara xwe ya navdar; "Texture, Text and Context" de vê yekê bi detay îzah dike (bnr: Dundes, 1980: 20-32). Eger em bi awayekî zelaltir îfade bikin, ger ku hikayetek ji hafîzeyê gel derketibe, di şexsê wê hikayeyê de ew cure êdî tune ye an jî eger hikayet hebe jî ku vebêjekî wê tunebe dîsa berdewamîya wî cureyî li wê dere qediyaye û herî dawî hikayet hebe, vebêj hebe lê civata guhdar tunebe jî ne pêkan e ku ew cure berdewam bike. Ev hemî bi hev ve girêdayî ne û kevneşopê temam dikin. Têkçûna hemî cureyên folklorî bi vê kontekstê ve girêdayî ye. Lê ji ber ku di nava civaka kurd de rewş bereksê vê ye, kevneşopê destanî di nava civaka kurd de gelekî xurt e û ev rewş digel zeîfbûn û veguherînan jî hîn berdewam e.

2. Ji Alîyê Tema û Mijarên Xwe ve Destanên Kurdî

Di destanan de tema, xala herî giring e ku fikrîyata destanê li dû wê teşekul dike. Ya rast mijara destanê, sîlsîleya bûyeran û karakterên ku derdikevin pêş me hemî ji bo temamkirina temaya destanê ne. Giringiya temayê ji bo destanê ew e ku ew ji nava fikrîyata giştî ya civakê derdikeve û herwiha mesajêke bingeîn e. Jixwe sedema ku destan li hember pêlên demê zêde di ber xwe didin û mewcûdiyeta xwe diparêzin jî di vê temayê de veşarî ye. Tema li gorî mijarê çarçoveyeke firehtir e û bêtir razber e. Mijar li gorî temayê bêtir şênber in û ji alîyekî ve realîzekirina temayê ya di nava berhemê de temsîl dikin. Mijarên destanan bi piranî yan li ser bûyerên rasteqîn ava dibin an jî vebêj û guhdar ji rasteqînîya wan bawer in (Degh, 2006: 147-150). Lê di vir de her çendî ku kakila bûyerê rast be jî ew bi hêmanên fantastik/derasa tîr rapêçan û li gorî dem û tarîxa ku destan teşekul kiriye, ji xeyalsaziya civakî gelek hêmanan digirin nava xwe. Evîn û lehengî temayên bingeîn in ku di destanan de derdikevin pêş me. Mijar jî honandina van têgehên giştî ya di nava berhemê de ne. Wekî mînak temaya herdu destanên *Cembelî û Binevîş* û *Memê Alan* jî evîn e. Lê mijarên wan ji hev cuda dibin. Di yekê de evîna ku encama wê trajedî ye heye û di ya dî de evîna ku bi dilgeşî diqede heye.

Di destanên civaka kurdan de du temayên bingeîn ku derdikevin pêş me evîn û lehengî ne. Ev herdu temayên sereke di destanên piranîya miletan de derdikevin pêş me. Li kêleka van herdu temayan carina temayên exlaqî jî di destanan de tîr dîtin. Çawa ku di *Zembîlfîroşa* kurdî de an jî di *Yûsûf û Zuleyxayê* de derdikeve pêş me. Di destanên bi vî rengî de bi piranî prensîbeke exlaqî wekî mesaj bi rêya destanê tê neqilîkirin. Ev prensîba exlaqî dibe ku piştî xwe bispêre bawerîyeke dînî jî. Di binê van temayan de gelek mijar derdikevin pêş me. Mijarên dîrokî û dînî jî di navê de ne.

Di *Destana Memê Alan* de digel ku evîn wekî temaya bingeîn derdikeve pêş me, hesûdî jî wekî wecheke vê temayê xwedî bandor e. Li vê derê çawa ku sedema evînê nayê aşkerakirin, sedema hesûdiyê jî pirî caran aşkera nayê gotin. Lewre destan, ne metnên îzahatên dîr û dirêj in. Ew li derdora fikrîyatê an jî fikra saf tîr îşakirin. Di destanan de çawa ku sedema wêrekî an jî lehengiyê nehatibe îzahkirin, sedema newêrekî an jî nedurustiyê jî nehatiye îzahkirin. Ev cure vegotin dibe ku di vegotinên nûjen wekî roman û çîrokan de derkeve pêş me lê di vegotinên gelêrî de, îzaha vê rewşê pirî caran nayê kirin. Bêguman lêkolînerê dikare li dû şîroveya sîlsîleya bûyeran xwe bigihîne analîzeke psîkoanalîtîk lê ev ne analîza vebêj an jî dengbêj e.

Lewre hesûdî jî hezkirin jî du hîsîyatên bingeîn yê mirovî ne. Carina di destanên mezin de, ev tema li karakterek ew çend tîr ku mirov dikare wî/wê karakterî/ê wekî arketîpa wê fikrê

helsengîne. Wekî mînak, Beko, dikare wekî arketîpa hesûdîyê bê nirxandin. Yek dikare îdîa bike ku di vê destanê de, serleheng, yanê karakterê esasî ne Mem an jî Zîn e lê Beko ye.

Di *Destana Memê Alan* de, di hemî varyantên wê de, Mem êvarê Zînê ji nişkêve li ser textê xwe, di nava nivînên xwe de dibîne. Ev yan cureyekî xewnê ye yan jî cureyekî sêhrê ye. Ji alîyekî dî ve jî ev, îşaret bi hêmanên derasayî û arkaîk yên destanê dikan.

“Ay Rebî tu bikî ferware
Zîna Mîr Sêvdîn ser me bikî çare
Post jor da têne xware
Her sê kevok çepilê Zînê digirin û digerînin
Ser pencera Memê Ala datînin” (Kurdo, 1996: 28)

Lê ji wê kêliyê şûnde çavên Mem ji xeynî Zînê tu kesê nabîne.

“Gotin: Eman, Memo, tu çi dikî? Bê te nîne tu hêvîya me her çarane

Were guh bide me mekeve ber bayê xewneke şevane

Ewa şeytan e dikeve şiklê qîzane

Dikene bi kal û xortane

Ji bona xewneke şevan, me giştikan mexîne şîn û yasane

Meêşîne dile dost û xêrxwazane

Mekenîne devê neyar û dijminane

Memî got: Bavo ji xwe ra mekin gunehane

Hûn li rûyê min disekinin bi xatûnan ra dibêjin: Va şeytan e!

Di hundirê min de çêbûye derdekî mezin û kuleke giran e

Rehên canê min sist bûne di qotê serî da heya binê lingan e

Di hinavê min da vêketiye arê darane

Rivên û pêtî davêje taqê ezmanê heftane

Dermanê min tune li bajarê Mixribiyane

Dermanê min pirî dûr e li bajarê Cizîra Botane

Tasek ava Kaniya Qestelê li ser destê Zîna Zêdan wê ji min ra bibe hekîm û dermane”

(Lescot, 2013: 45)

Di vê pasajê de em hezkirina saf ya Mem dibînin. Herçendî ku di varyanta Lescot de, hê di xortaniya wî de behsa hin lehengiyên Mem bê kirin jî wekî mînak; çîroka girtina hespê wî yê bi navê Bor an jî Bozê Rewan ji nava behrê (bnr: Lescot, 2013: 28-29), bi giştî tevger û helwestên Mem ji yên lehengekî kevneşopî bêhtir, tevgerên evîndarekî saf û hesas in. Li kêleka wî pêlwan an jî qehremanên mîna Bengîn û Qeretajdîn hene lê di tu varyantên Memê Alan de, bûyer li derdora qehremanîyên wî teşekul nakin. Jixwe di destanên ku temaya wan ya esasî lehengî ye, bi piranî şerên eşîrî an jî etnîk an jî mezhebî hene û leheng di van şeran de xwe ispat dike an jî qedera miletê diguherîne. Wekî mînak; Rustemê Zal, Derwêşê Evdî. Lê di *Memê Alan* de em rastî rewşek bi vî rengî nayên. Heta di hin varyantên *Memê Alan* de, Mîr di binê femandariya Qeretajdîn de, artêşê, tevî Mem ji bo şerê eceman dişine (an jî li dû hin varyantên dî, mîr tevî hemî mîr û xortên Cizîrê derdikeve nêçîrê) lê Mem di rê de xwe bi hîleyê (zanebûn) birîndar dike û ji artêşê vediqete û vedigere bajarê Cizîrê.

“Memî rahişte destê Zînê got: De rûne xatûn ez heyranî van çavan e
 Ji bona ku bigihême te min destê xwe avête qulpê derewane
 Li stoyê xwe danî kirasê tirsonekane
 Lingê xwe da ber devê şûrane” (Lescot, 2013: 120)

Di destanên ku temaya wan lehengî ye, leheng bi vî rengî ji şer narevin. Ev ji bo wan dê bibe zeîfîyeke mezin.

Li kêleka evînek wiha saf, di heman demê de peydabûna hesûdî an jî dexesiyek saf an jî bêsebeb, di hîkayeyên gelêrî de bi berbelavî derdikeve pêş me. Ev herdu hîsên bingeîn di prosesa destanê de her tim bi hev re di şer de ne û bi piranî encamake şerê wan tune. Di *Memê Alan* de, di kêliya hevnasîna Beko û Mem de, Beko xwe wiha bi Mem dide naskirin.

“Dibê herçar bi hevra meşîyan
 Mîr Zeydîn, Qeretajdîn û Beko ji hevra gotin:
 -Em nizanin ê li mala kî ji me hersîya bibe mêvan.
 Beko ji Memê ra go: Ya Memê
 Hege tu li mêranîyê û hakimîyê digêrî tê herî mala Qeretajdîn
 Hege tu li fesadîyê û li bêbextîyê û li e’wanîyê digêrî

Tê bêyî mala min- Bekoê bêîman û bêdîn.” (Celîl, 2013: 59)

Di vê pasajê de em dibînin ku xerabî an jî hesûdiya Beko, ne bi Mem ve girêdayî ye. Ew ji xwe parçeyeke şexsiyeta wî ye ku ew bi xwe jî vê qebûl dike (bnr: Subaşı, 2023, 148-176). Lê di gelek varyantên *Memê Alan* de, em dibînin ku qîz an jî xuşkeke Beko ya bi navê Zîn heye ku sêrbaz e. Beko ji ber ku dizane Mem kurê mîrê Muxurzemînê ye, dixwaze Mem bi qîz an jî xuşka wî re bizewice ku dê ev ji bo wî bibe payeyek mezin (bnr: Kurdo, 1996: 97,127-128). Yanê wekî sedema hesûdiya wî ev tê îmakirin. Lê dîsa jî em ji prosesên van destanan jî dizanin ku Beko berîya ku li Mem rast bê jî, xwedî heman karakter e. Yanê hesûdiya wî ji meseleya Mem û Zînê bêrî ye.

Herçendî ku di destanê de wekî xaleke detay derdikeve pêş me jî divê em balê bikêşin serê ku carina temayên giring di detayan de veşarî ne. Di *Destana Memê Alan* de, hema bêje di hemî versiyonan de em hîn dibin ku Zînê dergistîya Çeko ye.

“Memê got: Ew qîza min hebandî
Ne mîna ereba lêv deqandî
Navê wê xatûn Zîn e
Xuşka Mîr Sêvdîn e
Dergistiya Çekan e
Bûka Qeretajdîn e” (Kurdo, 1996: 123)

Mem digel ku bi vê rewşê dizane jî dev ji evîna xwe bernade. Qeretajdîn jî li benda Memî ye ku ew bi xwe vê rewşê çareser bike lê piştê ku Mem di evîna xwe de bi israr e, Qeretajdîn li ser soza xwe ya destbiratîyê dimîne û ji birayê xwe Çeko dixwaze ku dev ji Zînê berde. Digel ku sedema trajediyên destanan tu car nehatibin îzahkirin jî dibe ku hin sedem di detayên bi vî rengî de veşarî bin. Lewre destan bi xwe mesajeke fikrî û exlaqî ne.

Di *Destana Siyabend* de, herdu temayên bingeîn; evîn û lehengî derdikevin pêş me. Ya rast temaya esas ya destanê lehengî ye. Lê Siyabend ne lehengekî civakê, an jî xelaskarekî civakê ye. Ew ne lehengekî îdeal e. Ew lehengekî zordest e. Ya rast ew bi temamî ne leheng e. Lewre lehengî, li kêleka wêrekî û hêza fîzîkî, wateyeke exlaqî jî di xwe de dihevine. Lê di lehengîya Siyabend de ev wateya exlaqî tune ye. Siyabend ji zaroktî ve bê dê û bav dimîne. Di mala apê xwe de mezin dibe lê hê di zaroktîya xwe de dest pê dike li kesên derdora xwe zulmê dike.

Herçendî ku di tu varyanteke destanê de sedema zulumkariya wî aşkera nehatibe gotin jî dibe ku fikrîyata civakî li vê derê balê dikêşe ser bê dê û bav mayin û lewma bê merhemet mezinbûna wî.

“Dibê e’mrê Gurî (Siyabend) bû donzde salî, Gurî û zoroka diçine bêndera ji xwera dileyîzin, Gurî her şiqamekê li zaroka dide, sawa xwe xistiye ser zarokê gund. Çiqas zarok çêv pê gurî dikevin, ditirsin û ji tirsê wî dilerizin. Gurî gote wanaka: Gelî zaroka! Go: Ha. Go: Apê min Mih’emed, mixtarê bavê weye, ez jî mixtarê weme. Ji îro pêva, em çîqa derêne çolê, yek ji we destvala neyê, ji hêka ji mirîşka ûnê bînin. Emê li çolê bipijînin, bixun, kêfa xwe bikin, dinîya çawa bûye bila ûsa here.”(Celîl, 2013: 104)

Herwekî ku em di vê pasajê de jî dibînin, vebêj di heqê zordestîya Siyabend de tiştek an jî îzahek nake. Bi tenê em dizanin ku ev zordestîya wî hê ji zaroktîya wî de dest pê dike.

Balkêşîyeke di ev e ku, di vê varyanta Siyabend de, Siyabend wekî karakterekî psîkopatolojîk li pêş me ye. Ew her ku zulmekê dike, bi xwe jî hay ji zulma xwe heye û piştê zulmê dixwaze xêrek bike da ku “xêr û gunehên wî hev derbixin”. Di pasajek destanê de Gurî ji jina gavan hinek nanê tûrê û mehîra e’lbê dixwaze û jina gavan nadê. Li ser vê Gurî bi “çîma devê” lê dixwe parsûyê wê dişikîne û nanê tûrê û mehîra e’lbê jê distîne. Piştî ku dixwe û têr dibe hê nû li xwe vardiqile û kirinên wî tîr bîra wî û wiha dibêje:

“Xudêyo ez qurbana te bûmo
Tiştê ku min kiriye kesî li dinyayê nekiriye
Ez zanim vêga çêvê zarokê wê qerimîne li rêye
Ezê rabim rahêjime destê wêye
Wê bivime nava ciyê wê ye
Gazî zarokan kim, nanê wan û mehîra wan deynime berêye
Belkî xêra min û gunê min li berhevda derêye.” (Celîl, 2013: 106)

Gurî piştî vê bûyerê wekî ku gunehên wî hatibin bexşandin dîsa dest bi zordestîyeke di dike. Dikeve nava garana gund û hemî heywanên wan dide ber kêran û dikuje.

“Gurî rahişte kêrikêye, çîma devêye
Û dirêj kire nava garanêye

Kîja çêleka ku digîjê
 Kêrkê li zikê wê dide
 Hûrê wê berdide e'rdêye
 Guhanê wan jê dike
 Yek çêlekeke sax û silametî naçe malêye
 Zêdeyî noginekê û conegekî nefilitî ji vê garanêye
 Gurî dibeze li pey conegayî û pey vê noginêye
 Apê Gurî bi Gurî dihesê, radihêje darê xwe û tê gazî gurî dike, dibê:
 -Gurî lao, ev te çi kiriye li rû –hevata dinêye
 Gurî dibêje: -Apo, bi we'daniya Xudê
 Ez weke ku westiyam pey vî conegayî û li pêy vê noginêye
 Ez ne westiyame li pey vê garanêye
 Dibê, Apo bila ev conega û ev nogina ji wera sax bimînin
 Sala we biqede ê conega bazde ser noginêye
 Wê nogin bizê, mastê wê çiqê hebe li dinêye, hewqa av berdine serêye
 Dewê xwe li hev para vekin
 Belkî xêra min û gunehê min jî di berhevda derêye.” (Celîl, 2013: 106)

Di vê pasajê de li kêleka karakterekî zordest û patolojîk, taybemendiya wî ya xeyalperestîya xerîb jî tê dîtin.

Di *Destana Siyabend* de xaleke dî ya balkêş ev e ku, ew berîya ku Xecê bibîne, aşîqî keçîkek dî, bi navê Gulperî dibe. Ev taybetmendî di destanên dî de tu car nayê dîtin. Leheng bi tenê evîndarê keçîkekê dibin û heya dawîn li wê evîna xwe sadîq dimînin.

Di destanê de profîla Siyabend ji aşîqekî hesas bêtir, derbederekî serberdayî ye. Ew li gorî kêfa xwe dijî, neheqî li mirovan dike, hespê Hesên Axa bi navê Deybîlqîran jê distîne û derdikeve macerayê. Rastî kesekî mîna xwe zalim tê, bi navê Qeregêtranê Salê. Bi rastî li vê derê, Qeregêtran, wekî mirov an jî heyinek xerîb derdikeve pêş me. Dûre di macerayên xwe de rastî qîza mîrê cinan, Ereba Zîncar tê. Ew her sê dibin heval û ji vê şûnde destan bi rasthatina li Xecê dikeve merheleyek cudatir. Bi tenê di vê beşa dawîn de evîn wekî temayekê derdikeve pêş me.

“Çûn bin vê konê hanêye
 Bala xo danê, qîzek di bin konda rûniştîye

Ev qîza hanê bînaye hîva çarde şevî
 Ko di serê çîyayê Qaf da derdikevî
 Tu tilîpantkê li e'niya wê didî
 Heta binê pe'nîyê reş û şîn dike
 Avê dixo, di gerdena wêda xuya dike
 Bînaye pelekî berfa serê çîya sor û sipî dike
 Nexşê kerge ji hervîşim bi destê xwe çê dike
 Dilê Sîyabend bi hezar dilî dikevêye
 Dibê hege sax be ji canê miraye
 Hege bimire ji boy e'rdêye.” (Celîl, 2013: 121)

Xecê jî wekî Siyabend dê û bavê wê tune ne lê heft birayên wê hene. Dema ku Ereb Zincar jê navê birayên wê dipirse ew wiha dibêje:

“Divê: Navê birayê te?
 Divê: Navê birayê min: Îtî, Wîtî, Qereqot,
 Malmîret, Pêxas, Pêe'bas, Canfidane.” (Celîl, 2013: 122)

Digel ku di rêzebûyeran de hêmanên derasayî pir tune ne, wekî ku di vê pasaja jorîn de tê dîtin, navên an jî heyinên ku bi piranî di çîrokên derasayî de derbas dibin, derdikevin pêş me. Dîsa lihevraştatîna Siyabend û Qeregêtran wekî cureyekî hevdiîtina Gilgamêş û Enkîdû tîne bîra me. Dema ku Enkîdû û Gilgamêş rastî hev tên û dest bi şer dîkin erd û ezman ji heybeta şerê wan diheje.

“Li navenda bazarên welatî rastî hev hatin
 Enkîdû rêya dergehî li ber Gilgamêş girt
 Bi lingê xwe
 Bo nehêle Gilgamêş derbas bibe
 Her duyan bi hev girt
 Wekî du gayan dikirin borîn
 Stûnên dergehî herifandin
 Dîwar lerizîn.” (Evdilfetah, 2019: 58)

Eynî mîna şerê Siyabend û Qeregêtran.

“Ezim Qeregêtranê salêye
 Ezê bigurgurîname te ferekî destarî aşêye
 Ezê bikim heft tebeqa tu herî binê erdêye
 Sîyabend go: Herê lo lo lo lo
 Ez Sîyabendim, Sîyabendê dînim
 Bi biçûkayê xwe yê berê, sed û pêncî xortê silîvaniya
 E li ser sergoyê rêxê vedizelînim.” (Celîl, 2013:118)

Gilgamêş jî di eslê xwe de lehengekî zordest e:
 “Gilgamêş nedihişt tu bav bi hebûna kurê xwe şa bibe
 Roj û şev karê wî zordestî bû.” (Nemir, 2000: 21)

Wekî ku me di pasajên jorîn de jî nîşan da, Siyabend lehengekî zordest e. Li gorî hin varyantên destanê; Siyabend, Xecê bi zorê di daweta wê de direvîne. Herwiha di piranîya versiyonên destanê de Siyabend wekî xortekî nexweşik, cîrnexweş tê teswîrkirin (bnr: Cindî&Evdal, 2008, 560-573). Ji xwe di vê varyantê û piranîya varyantên dî de em hîn dibin ku ew gurî ye, yanê porê wî tune. Bi gotineke dî Siyabend di nava destanên kurdî de ji leheng bêtir temsîla antî-leheng dike. Di wê epîzota bi nav û deng ya destanê de ku trajedîya dawîn ya Siyabend dest pê dike; serê Siyabend li ser çoka Xecê ye û Xecê refên pezkûvîyan dibîne û dibîne ku di nava wan de yê herî nexweşik lê bi qewet berê hemî pezkûvîyên nêr dide û li ya mê xwedîtî dike û Xecê halê xwe û Siyabend dişibîne wan û digirî, hêsirên wê diherikin ser rûyê Siyabend û Siyabend sedema girîya wê hîn dike radibe ku here wî pezkûvîyî bikuje lê piştî kuştina wî gêr dibe dikeve kortala bêbinî. Ji xwe di gelek cihên destanê de vebêj piştî ku behsa serboriyên Siyabend dike, her tim îma dike ku wê serê wî ji ber van kirinên wî bikeve belayên mezin:

“Berî û berîstan, Çol û Çolistan
 Havîn çû ma zivistan
 Serê Siyabendê Silîvî hêja wê têkeve şer û deqê giran.” (Celîl, 2013: 119)

Bi giştî di *Destana Siyabendê Silîvî* de digel ku wekî temayek evîn heye jî ew hin caran dişibe evîna ku di çîrokan de derdikeve pêş me. Yanê di vegotinê de li ser evînê ew çend israr tune. Bêtirî destan li derdora macerayên Siyabend teşekul dike û maceraya wî ya dawîn evîna wî ya bi Xecê re ye.

Di *Destana Xanê Çengzêrîn* de, tema bi temamî lehengî ye. Ev destan li gorî destanên dî, xwe dispêre bûyerke dîrokî. Şexsiyetên ku di vê destanê de derdikevin pêş me, bi piranî şexsiyetên rastîn in. Lehengîya ku di vê destanê de derdikeve pêş me ji lehengiyên destanên dî cudatir e. Di binê lehengîya Xan de hîsên etnîk an jî dînî hene.

“Ha rabû, rabû, rabû
Xanê Çengzêrîn rabû
De rabê rawesta bû
Sîlih bejinê ava bû
Xencer bejinê duta bû
Çav rengê sitîya mabû

Go: Sitîno, ha sitîno
Paşî me Kurmancî no
Gava Xan ew xeber digotin
Dilên bûka disotin
Gotin: Mirin xweş e ji vê jîyînê” (Cindî, 2016: 173)

Di hin varyatnên destanê de mijar li derdora dînamîkên dînî û mezhebî hatiye avakirin û di hin varyanên dî de ji dînamîkên dînî mezhebî bêtir dinamîkên nasnameya etnîk û eşîrî hene.

“Xan kelê dimeşîya
Eceman tacek şand pêşîyê
Go: Herê Xano tu Kurmancî
Xwe ra hilîne vî tacî
Hê min şer nekiriye bo armancî

Go: Tacê te serê te be
 Gû di nav meshebê te be
 Her navê Kurmancîyê bira hebe” (Cindî, 2016: 174)

Di varyanta Feqiyê Teyran de hîsên dînî-mezhebî li pêş in:

“Helal kirye tahayê
 Mezhebê qe kêr nayê
 Em dimrin nayne rayê
 Axret xoştir e j’dunyayê

Qeda l’dunyayê b’kevî
 Dê rûreş bin l’nik nebî
 Qebûl nekin vî mezhebî
 Hemyan go belave bî.” (Sadinî, 2020: 383)

Balkêş e ku di vê destanê de, ecem di gelek deran de ji ber cudahiyên mezhebî wekî “kafir” tê binavkirin. Di gelek varyantên destanê de ev bêjar derdikeve pêş me. Piştî ku Xan û leşkerên wî dimirin û artêşa Şah hemî kelê dorpêç dike û ji dêya (an jî keça) Xan dixwaze ku teslîm bibe, dîya Xan wiha dibêje:

*“Kafir, paşî van nevîyan, paşî van kuran ez tac nadime serê xwe. Ez xwe dikujim nayê
 cem te.... Cixara wê sor bû. Ji jor da nav cebirxanê da kuta. Lêda kela bela belayî kir, avît,
 ew muxluqatê tê da qir kir. Her otaxek ma. Jineke hemle tê da ma. Ew jinik jê xilaz bû, jina
 Evla Begê bû. Mala bavê wê li Hekarîyê bû. Çû nava Hekarîya. Wê derê Xwedê kurek dayê.
 Silsileta wê malê hê heye. Salê carekê li wê derê hema wê rojê padişê ecem ra û yê Romê
 ra şer dikin û kuştîyê kelê bi bîr tînin.”* (Cindî, 2016: 179)

Bi giştî di Destana Kela Dimdim de, di hemî varyantan de tema lehengî ye. Li kêleka temaya lehengîyê temayên mîna sdaqet, îxanet û mirinê jî hene. Lê mijara destanê li gorî varyantan diguhere. Di hinan de lehengî li dû dînamîkên dînî-mezhebî hatiye realîzekirin û di hinan de jî lehengî li dû dînamîkên eşîrî-etnîk hatiye realîzekirin.

Di *Destana Zembîlfiroş* de evîn wekî temaya sereke li pêş me ye. Li vê derê evîn wekî ku di destana Memê Alan de derdikeve pêş me ne evîneke saf e lê daxwazeke cinsî û şehwetê di hewîne. Mesaja bingeîn ne li ser pesinandina evînê ye. Xwedûrxistina ji şehwet û xweşîyên dinyayê mesajeke bingeîn ya destanê ye. Ev mesaj di destpêka destanê de derdikeve pêş me:

“Zembîlfiroş kurê mîran e
Lawekî bejin ruhan e
Xwedanê koçk û dîwan e
Lê keyf û seyran şev û roj

Şevêkî şeva înnî bû
Xewnek e’caêb dîtîbû
Li nav xwe da girîbû
Dil û hinav lê hate coş.” (Bazîdî, 2002: 13)

Di vê varyantê û gelek varyantên dî de Zembîlfiroş wekî lawê mîr tê nasandin lê di hin varyantan û varyanta Feqîyê Teyran de ew wekî lawekî feqîr tê nasandin.

“Zembîlfiroş lawek rewel bû
Bi kulfet û ehlî ‘eyal bû
Husneka Yûsuf li bal bû
Heqqe rezzaqê qismetê

Ew qewî lawek feqîr bû
Daîma Xudê di bîr bû
Di pîşê selkan jîr bû
Dest fikir bi wê sine’tê” (Sadinî, 2020: 399)

Statuya civakî ya lehengê destanê, tesîreke xwe ya mezin li ser mesaja destanê heye. Ev rewşa xerîb di tu destanên dî yên kurdî de nayê dîtin. Yanê wekî mînak di tu varyantên Memê Alan de, Mem wekî lawekî ji rêzê nayê nîşandan. Ew di hemî varyantan de lawê paşa an jî padîşahê Muxurzemînê ye. Yan jî di tu varyanteke Siyabend de nehatiye dîtin ku ew lawê mîr an

jî pêşengekî civakî be. Digel ku di piraniya varyantan de apê wî wekî muxtarê gund hatiye teqdîmkirin jî Siyabend bi xwe li koşk û serayan mezin nebûye berevajî vê di nava feqîrîyê de mezin bûye heta dizî û talana xwarin û heywanên gundîyan kiriye herwiha hîç behsa malabata wî û esilzadebûnê nehatîye kirin.

Di *Destana Zembîlfiroş* de rûdana rewşeke bi vî rengî li gorî çend xalan dikare bê şîrovekirin. Bi ya min ev mudaxeleyeke bi zanebûn e li destanê. Lewre di varyanta pêşîn de, ku Zembîlfiroş kurê mîr e û ji hemî zewq û kêfên dunyayê tahm kiriye, ew bi mal û mulk û bi kêf û zewqê tê îmtîhankirin. Yanê li vê derê mesajê destanê ji mîr û began re ji erkdar û pêşewayên civakê re ye. Civak an jî dengbêj mesajê dide xwedan mal û mulkan ku; ew qas xwe bi mal û mulkê dunyayê re ber nedin, nedin dû û nebin esîrê kêf û zewqên dunyayê. Yanê hedefa mesajê mîr û beg û maldar in.

Di varyanta dî de, mesaj ne ji bo mîr û began e lê ji bo civak û feqîran e. Ew bi xweşikî û şehwetê tê îmtîhankirin. Yanê tu feqîr î û îdara xwe bi firotana selikan dikî, digel ku tu pir xweşik î jî eger fîrsetek derket pêş te, keseke wekî Xatûnê ji bo evîn û şehwetê bang li te bike jî tu tenezulê wê neke û ji rêya xwe ya feqîrî û derwêşiyê veneqete.

Di çîrokên gelêrî û destanan de pirî caran evîn wekî sembola hesret, fedakarî, xwe bexşandin û tenêmanê ye. Lê di vê destanê de evîn bi tevahî tiştekî şênber e, dunyawî û cinsî ye:

“Xatûn dibê çare tu nin e
Qerm neke were nivîn e
Min bi te daye evîn e
Da bibînim ji te lezzetê” (Sadinî, 2020: 403)

Di vê destanê de jin bi wesfeke nebaş an jî xapînok hatiye teswîrkirin. Ev cure fikir, bingeha xwe ji hin temayên dînî digire ku jin mirovan ji rê derdixin an jî xweşikiya jinan, cazîbeya wan ya cinsî ji bo mirovên ku xwe dane rêya xweda îmtîhanek e. Bêguman xweşikî û cazîbeya cinsî ya jinê lûtkeya jorîn ya kêf û zewqên dunyawî temsil dike.

“Rûnî ser doşega mîr
Ez paşî dê tekem wezîr. ” (Bazîdî, 1976: 70)

Di vê beytê de Xatûn/Gulxatûn li kêleka evîna cinsî mal û meqam jî pêşkêşê Zembîlfiroş dike lê Zembîlfiroş vê pêşniyazê red dike. Em dikarin vê destanê ji kevneşopa wêjeya medreseyê hesab bikin. Loma tê de motîfên, îmtîhanên exlaqî gelek in. Di çîrok û destanên gelêrî de jî motîfên îmtîhanê hene. Lê di yên bi vê cureyê de bi piranî di dawiya îmtîhanê de leheng digihîjin evîna xwe, mirazê xwe an jî li dû vê mirazê dimirin. Li vê derê di destpêkê de evîn, evînek şewhî ji leheng re tê dayin lê ew li dû jiyana derwêşane, xwe jî vê dût dixe. Diyarîya wî jî axiret e. Ji xwe di destanê de ev şîret her tim tê kirin:

“Ger bi rojê ger bi şev e
Ta’et bikin hûn bi xew e
Her çi rast e ceza ev e
Da hûn nebin ji axretê” (Sadinî, 2020: 413)

Bi kurtî di *Destana Zembîlfiroş* de di hemî varyantan de tema evîn e lê li gorî varyantan wechê vê evînê diguhere yanê di mijara destanê de cudahî çêdibe.

Di *Derwêşê Evdî û Edûlê* de, evîn û lehengî du temayên giring in. Lê li kêleka van herdu temayan mijarên nasnameya dînî, etnîk û eşîrî mohra xwe li temayê dixin. Ji alî tema û mijarê ve destana herî komplîke an jî lehengê herî komplîke Derwêş e. Di destanê de di destpêkê de Derwêş ji ber ku êzîdî ye Edûlê nadine pê.

“Lê belê ez ji we ra bêjim salixan e
Îsal heft sal e dilê Derwêş
Li Edûla qîza mîrê Mila da ne
Ez diçime xazgîniyê Edûlê ji mi ra dibêjin
Eslê te Êzîdî ye pîrê te Şeytan e.” (Uluçay, 2012: 231)

Lê dema ku eşîrên ereban dixwazin êrîşê eşîra Kîkan û Milan bikin, kes naxwaze xwe bide pêş, lewma bavê Edûlê, serê eşîra Milan, Zor Temir Paşayê Milî, dibê kî xwe bide pêş û bi eşîra Gêsan re, Çilosmanî re şer bike dê qîza xwe Edûlê bide wî. Lê dîsa jî kes newêre xwe bide pêş, bi tenê Derwêş dimîne. Digel ku Edûlê hişyarî dide Derwêş û dibêje bavê wê dixwaze wî bişîne rêya çûn û nehatê jî Derwêş ji ya xwe venagere:

“Derwêşê Evdî digot:

Tolê de rabe li ser rê û dirban e

Ne gede me, ne gûde me, ramûsan an bistînim

Li taldê tepik û devê avan e

Diçime ser eskerê Çîlosman e

Bi qewet û raya rehmê rehman e

Ezê bi gotina Xudê bi hedîsa Pêxember

Te ji xwe ra bikim kebanîya mala di giran e.” (Uluçay, 2012: 245)

Di vê destanê de, li gorî destanên dî bêjara nasnameya dînî û etnîk li pêş e. Li hember talankerîya eşîrên ereban, berxwedana bi hev re ya eşîrên Êzîdî û Musulman yên kurd derdikeve pêş:

“Evdê Milhim derbekê lê dide li kêleka egîda Gêsanê

Go: Bila xwîna te birîjihe ser erdê Kurdan e

Ta ku Gêsan bizanin xwîna Kurdan ne erzan e

Bavê Etma; ez te nakujim

Te bidim xatîrî Tawîsî-Melek sund Êzîdiyane

Lê ezê birînekê li canê te bikim

Tu ji bîr nekî mêraniya me Kurdan e” (Uluçay, 2012: 200)

Di *Destan Derwêşê Evdî* de jî di dawiyê de lehengê mêr dimire.

Di *Destana Cembelî û Binefşa Narîn* de, temayên lehengiyê pir kêr in. Temayên jiyana eşîrî hene lê temaya esas evîn e. Derwêş Axa, axayê êlê, ku emrê wî heştê salî ye, bavê Binefşê dîkujê û wê bi zorê direvîne. Cembelî ku dilê wî di Binefşê de heye vê rewşê hîn dike lê dev jê bernade û heft sal şivanîya pezên mêrê Binefşê dike. Ji bo aşîqekî sadiq bêguman ev îmtîthaneke girîng e. Binefşê jî tu car dev jê bernade. Piştî heft sal encax dikare ji bo bêriyê ji malê derê û piştî ku derdikeve jî bi Cembelî re direve. Di nava hemî destanên kurdî de destana ku tê de evîndar digihîjin mirazê xwe ev e. Di yê dî hemî de bi rengê encama trajîk heye.

“Binefşa Narîn hilanî go:

Sazbendo lawo

Dilê min dibêyo, sed carî dibêyo
 Hûn bidin di xatirê Xwedêyo
 Binêrin hûn çî dixwazin
 Ezê we têr kim ji malê dinêyo
 Herin axangê xwe ra Cemîl Begê kurê mîre Hekarîya ra bêjin bila bêyo
 Ezê wa ye rûniştîme li pêş perdêyo
 Ser xalî û xalîçêyo
 Eger bi gorî layîqî min bû
 Sê cara jê ra temîn dibim
 Radibim li ser pêyo.” (Cindî, 2016: 74)

Balkêş e ku di vê destanê de, digel ku Cembelî begê eşîreke giran e jî ne bi rêya şer lê bi rêyeke dî dixwaze meseleyê çareser bike. Ew dest ji hemî mal û mulkê xwe dikêşe û diçe şivantiya Derwêş Axa dike da ku nêzî Binefşê bibe.

“Go: Binefşa Narîn, dilê min yan e
 Evê ku îsal heft sal ji kopekê mêrê te ra bûye şivan e
 Bexê salê tev bûne beran e
 Tu hê dipirsî xweyê vê xencerê kîjan e.
 Go, Binefşa Narîn hilanî go:
 Xencera Cemîl Begê min cewahir e
 Şewqa xwe daye nav elba şîr e
 Çawa ku cî da xerab kiribû serîkî penêr e.” (Cindî, 2016: 81)

Di Destana Cembelî de, berevajî destanên dî, hema bêje qet hêmanên fantastîk an jî mubalexe tune ne. Bi tenê temayên evîn, fedakarî û sêdaqetê hene. Di hin guhertoyên vê destanê de; kurekî Binefşê ji Derwêş Axa çê dibe û Binefş navê Cembelî lê dike. Loma ew pasaja navdar bi berbelavî tê zanîn:

“Wî de lorî lorî lorî Cembelîyê mi looorî”

Di *Destana Kerr û Kulik* de, bi tenê lehengî temaya esas e. Herçendî ku keçikek bi navê Perîşanê heye jî, evîn ne temayeke bingehîn e. Îmtîhanek li pêş Kerr e ku; ew karibe Bilêcana Eliyê Sala ku xalanê wî ne bîne, dê Perîşanê bidine pê. Digel ku Kerr dizane dê bi ser nekeve jî vê qebûl dike û di dawiyê de dimire. Dûre, Perîşanê bi cewîkê wî yanê bi Kulik re dizewice ku ev jî xalekî balkêş e.

“Erê go Îsê rabe ji xewêye
 Bavê min lêxin defa hewarêye
 Gelo go rabe lêxe defa hewarêye
 Sedbîstpênc mêrê bokebaran bîne aliyê odêye
 Fîncanên deyne ser tablêye
 Zerfa li ser table, table li ser masêye
 Kî here bîne Bilêcana Eliyê Salaye
 Ezê bidimê Perîşanê bi heft qûweta Xwedêye.” (Gültekin, 2013: 100-101)

Herçendî ku di vê guhertoyê de hîç behsa Êzdiyatîyê nayê kirin jî herêma ku Kerr û Kulik diçinê da ku Bilêcana Eliyê Sala bînin, Şengal e ku ew mala xalanê lehengên destanê ne. Di vê destanê de, diya lehengan “Wardê” jî cihekî giring digire. Wekî karaktereke jin ew jî Perîşanê bêtir cih digire.

“Eliyê Sala go, Kulik law, dilê min ji dilanî del û dîne
 Deyşta Heranê dar û bîne
 Min lazimî te û mirazê te nîne
 Tu ji beriyê derketî, li Şengalê xwe li xala diceribînî
 Ezê rimekê li te xim, şîrê Wardê ji pozê te ra bînim
 Ezê herim dergistiya te ji birê xwe yê piçûk ra bînim

Kulik go, xalo ez Kulik im, Kulikê dînim
 Mija li rû erdê û esmînim
 Lawê Silêmînim
 Kurê Warda dînim

Ez ji maleka xerab nînim
 Ji toximê we nikarim xwe biêşînim
 Ezê we şeşa bikujim, diranê te yek bi yek bikişînim
 Ezê te ji diya xwe ra hêsîr bînim.” (Gültekin, 2013: 118)

Encam

Her çendî ku li ser pênaseya cureyê destanê nîqaş hene jî di nava civaka kurd de gelek berhemên gelêrî hene ku di çarçoveya vî cureyî de dikarin bêne nirxandin. Me jî di vê xebatê heft vegêranên giring di vê çarçoveyê de nirxandin. Ji analîza li ser metnan, me dît ku ew ne berhemên heman serdemê ne lewre di hinan de wekî *Memê Alan* û *Siyabend* û *Xecê* hêmanên fantastîk hene û di hinên dî de wekî *Derwêşê Evdî û Edûlê* û *Cembelî û Binevşa Narîn* hêmanên derasayî hema bêje hîç tune ne lê zimanekî xemilandî û kesayetên ne jî rêzê li pêş me ne. Lê ev hemî vegêran jî di nava çanda dengbêjîyê de kemilîne û bi heman formî hatine vegotin. Lewre ku ji alîyê tradîsyona dengbêjîyê ve di navbera *Derwêşê Evdî* û *Siyabend* de tu ferqeke cureyî dernakeve pêş me. Wekî ku me di dirêjahîya vê nivîsê de jî dît, temayên destanên kurdan bi giranî li ser evîn û lehengiyê hatine avakirin. Lê li kêleka van temayan mijarên dînî-mezhebî, wekî *Zembîlfiroş*, *Derwêşê Evdî* û *Kela Dimdim*, dînamîkên jiyana eşîrî wekî *Kerr* û *Kulik*, *Derwêşê Evdî û Edûlê*, mijarên dîrokî wekî *Kela Dimdim* tên dîtin. Her çendî ku di lehengîya Xanê Lepzêrîn de lehengîyeke saf û bê qisûr li pêş me be jî di lehengîya Siyabend de em şopên zordestîyê û li gorî wê zordestîyê jî encameke trajîk dibînin. Dîsa her çendî ku evîna Cembelî evîneke saf û bê qisûr bû jî di evîna Gulxatûnê de hêmanên azwerîya cinsî li pêş bûn û îxtîraseke yekalî hebû. Bêguman tema an jî mesaja destanê ne li ser îxtîrasa Gulxatûnê lê li ser sêdaqet û redkirina Zembîlfiroş hatiye avakirin. Di *Destana Derwêşê Evdî û Edûle* de li kêleka temaya evîn û lehengîyê mijarên dînî û etnîk bandoreke giring li ser temayê dikin û wekî mesajeke hişmendîya giştî ya civakê derdikevin pêş me. Bi kurtî di destanên kurdî de, bi rengekî hevterîbê destanên cîhanê, bûyer û honak li derdora jiyana kesekî/a ne ji rêzê, bi vegotineke xemilandî û carina tevî hêmanên derasayî li derdora temayên sereke wekî evîn û lehengîyê hatine honandin.

Çavkanî

Bauman, R. (2006). *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*. Geleneksel: Ankara
 Boratav, P. Naili (1988). *Halk Hikayeleri ve Halk Hikayeciliği*. Adam: İstanbul

- Celîl, O. (2001). *Bir Kahramanlık Destanı*. Avesta: İstanbul
- Celîl, C.-Celîl, O. (2013). *Zargotina Kurda I*. Aram: İstanbul
- Cindî, H. (2016). *Folklora Kurmanciyê*. Lîs: Diyarbakır
- Cindî, H&Evdal, E (2008). *Folklora Kurmanca*, Avesta, İstanbul
- Çaçan, X. (2010). *Cewahirên Kurdî*. Lîs: Ankara
- Degh, L. (2006). *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*. Geleneksel: Ankara
- Dundes, A. (2006). *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 1*. Geleneksel: Ankara
- Evdilfetah, D. (2019). *Destana Gilgamêşî*. Wardoz: İstanbul
- Gültekin, M. (2013). *Zargotina Kurdên Serhedê*. Avesta: İstanbul
- Kaplan, Y. (2022). *Helsengandinek Li Ser Cureyên Vegêranê yên di Folklora Kurdî da*, IJOKS. Volume 8 (2.). 273-292. <https://doi.org/10.21600/ijoks.1144690>
- Kardaş, C. (2013). *Dengbêjlik Geleneği ve Aşık Edebiyatı ile Karşılaştırması*. Teza NÇ. Elazığ
- Keskin, N. (2019). *Folklor û Edebîyata Gelêrî*. Avesta: İstanbul
- Keskin, N. (2019). *Zêrka Zêra*. Avesta: İstanbul
- Kurdo, Q. (1996). *Mem û Zîn Duwanzde Variyant*. Roja Nû: Stockholm
- Lescot, R. (2013). *Memê Alan*. Avesta: İstanbul
- Mukrîyanî, G. (1978) *Çîrokên Zembîfiroş, Deqê Miradxanê Bazîdî*. Aras: Hewlêr
- Nemir, K. (2000). *Gilgamêş û Çend Mythosên Din*. Jiyana Rewşen: İstanbul
- Oinas, Felix J. (2015). *Halk Biliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 3*. Geleneksel: Ankara
- Öner, N. (2016). *Mîrza Mihemed*. Avesta: İstanbul
- Subaşı, Kenan (2023), *Fesad û Bêbext Di Trajedîya Evînê da; Weku Nimûne Destanên Evîna Mêjûyî*. Mukaddime, 14(1), 148-178, <https://doi.org/10.19059//mukaddime.1243035>
- Subaşı, Kenan (2024). *Ji Mîtolojîyê Ber Bi Tarîxê û Ji Lehengîyê Ber Bi Evînê Destan Wekû Çemkeke Sîwan Di Vegêranê Gelêrî Da*, Şarkîyat. 2024
- Sadinî, X. (2020). *Feqiyê Teyran*. Nûbihar: İstanbul
- Uluçay, Ö. (2012). *Destana Derwêşê Evdî*. Dîwan: İstanbul